

Nûce û Calakî

Nûçe û Çalakî

6 Birêvebirên Platforma Danezana Şamê Serbest hatin berdan



Ehmed Tûme Ekrem Elbunî Cebir Elşûfî



Yasir Alîfî Fîdaa Horanî Welîd El bunî

Roja yekşembê 13ê meha Hizêrana 2010an, 3 birêvebirên payebilind ên Danezana Şamê a ji bo guhertina niştimanî a demokrat, piştî derbaskirina du sal û nîvan di zindanên Sûriyê de, serbest hatin berdan. Ew jî ev bûn: **Birêz Ehmed Tûme, Ekrem Elbunî, Cebir Elşûfî.** Piştî wê bi çend rojan ,ev birêzan: **Fîdaa Elhoranî, Yasir Alîfî û Welîd Elbunî** jî hatin berdan.

Hêjayî gotinê ye em bi bîra xwendevanên xwe yê birêz bînin, ku dadgeha (cinayetan) a yekem li Şamê, li dawiya Çirîya Paşîn a sala 2008an û bi tewana lawazkirina hestê netewî û belavkirina dengûbazên derew ji bo qelskirina derûna neteweyî, 12 birêvebirên Danezana Şamê bi du sal û nîvan ceza kirin. Ew jî ev birêzan bûn:

Riyad Sêf-Fîdaa Ekrem Horanî-Ehmed Tûme- Ekrem Elbunî- Elî El ebdullah- Cebir Elşûfî- Yasir El îfî- Telal Ebû dan- Welîd El bunî- Mihemed Hecî Derwîş- Merwan El îş- Fayiz Sare.

Gereke her şeş birêvebirên mayîn, jî bilî birêz **Elî Elebdullah** , yê ku dozeke nuh dijî wî dema ew di zindanê de bû vebûye- di Tîrmehê de serbest bêne berdan.

Bi navê weşana NEWROZê, em xwe, Danezana Şamê û hemî kes û saziyên ji bo demokrasî û guhertina aştiyane di Sûriyê de têdikoşin pîroz dikin. Herweha em wan xebatkarên niştimanî

bi serbestbûna wan pîroz dikin, bi hêviya ku xebata niştimanî ji bo guhertina demokratî ber bi pêş ve here, û welatîyên Sûriyê bi hemî nijad, ol û rengên xwe ve, azad û bi rûmet bijîn.

26.06.2010

Festîvala Feqiyê Teyran Li Wanê- Miksê li dar ket

Li bajarê helbestvanê bi navûdeng, Feqiyê Teyran -**Miksê**, di 19-21 Hizêranê de, bi rêvebirya parêzgehê Wanê û parlementera AKPê a Wanê Gulşan Orhan û bi alîkariya şalyarê karûbarên yekîtiya Ewropa ê Tirkîyê Egemen Bağış, Fastîvalaleke navnetewî li dar ket. Ji boneya Festîvalê, rewşenbîr, lêgervan û akademîkên Kurd, ji hemî perçên Kurdistanê û derve vexandibûn, bilî balyozên Yekîtiya Ewropa.

Ji ber bûyera li Çiyayên Wanê qewimiye, şahiya 19 an rawestî û berê mîvanan dan Kela Wanê.

Roja 20ê, hemî mîvan li Miksê civîn û serdana gora F. Teyran a li Warezozê – gora wî di gelîkiyekî û di nav daristaneke dijwar de ye- hate kirin.

Roja 21ê, Pirogram li ser helbestvanî, Felsefe û Tesewifa F. Teyran, ji hêla lêkolînerên Kurd û Ewropa ve hate pêşkêşkirin. Êvara herdu rojan, aheng hatin girêdan û stran hatin gotin.

Lêborîn..!

Di hejmarê 91an a weşana NEWROZê de, gotara bi sernava " **17ê Nîsanê, Cejna Niştimaniya welatê me Sûriyê**" ya bi pênûsa birêz **R.Silvî** hatibû nivîsandin, parçeyek bijarte ji pirtûka mamosta **Samiyê Mele Ehmedê Namî**"Dîmenin ji dîroka wînda" hatibû weşandin. Komîta Newrozê hin peyv jê guhertibûn, ango ew ji erebî kiribûne kurdî. Ji ber vê şaşiyê, bi navê weşanê em lêborînê ji nivîskarê gotarê dixwazin.

